zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



www.kovarakurd.org

Sal:1985

20

www.arsivakurdi.org



ZAROK FÊKIYÊN MALAN E

A L

Al,nîşana netewakî ye,nîşana serbixwebûn û azadiya gel e.Her gelek(miletek)xwedî alekê ye.Lê mixabin ala me Kurdan îro wek ya xelkê pêl nade,stuxwar e. Divê her Kurdek,rûmeta ala xwe bigire.Ev erka her her kurdekî ye.Al,şeref û namûsa welatekî û welat jî şeref û namûsa gel e.Daçikandin û pêlvedana ala rengîn divê bibe armanca me ya pêşîn û ev armanc jî ji xwestina serbixwebûna Kurdistanê pê ve ne tu tişt e.Ji vê yekê,her Kurdekî bi namûs divê ji bo serbixwebûna welatê xwe û ala xwe bixebite.Ev erka me ya dîrokî ye.



ALA MIN

Şerefa herî mezin tuyî
Gerdenazadî bi te
Di bin siya te de mimkun e
Bi te ye serbilindî
U serfiraziya me

Ey ala rengîn!
Ey hebûna me ya pîroz!
Tu sembola Kurdistanê yî
Ji bo te mirin erzan e
Ji boyî me şan e
Ger di ber te de bidin can!

MARŞA NETEWI

Ey raqîb her maye qewmê Kurd ziman
Naşikê û danayê topên zeman
Kes nebê Kurd dimirin
Kurd jî jîn divên
Jîn dibê qet nakeve
Ala Kurdan
Em xortên Medya û Keyhusrew in
Seyr bike xwîna diyan me da rijand
Kes nebê Kurd dimirin
Kurd jî jîn divên
Jîn dibê qet nakeve
Ala Kurdan
Em xortên rengê sor û şoreş in
De bi xwîn neqşîn bikin taca cîhan
Kes nebê Kurd dimirin
Kurd jî jîn divên
Jîn dibê qet nakeve
Ala Kurdan
Lawên Kurd rabûne ser xwe wek şêran
Dîn îman ayîn îman Kurd û Kurdistan
Kes nebê Kurd dimirin
Kird jî jîn divên
Jîn dibê qet nakeve ala Kurdan
Lawên Kurd tev hazir û amade ne
Can fedane can feda her can feda
Kes nebê Kurd dimirin
Kurd jî jîn divên
Jîn dibê qet nakeve
Ala Kurdan

www.arsivakurdi.org

MIROVÊN BERÊ

Em jiyana mirovên berê ji afirandin û pirtûkên dîrokê hîn dibin.Jiyana wan ne wek jiyana me ya niha bû. Xanî û hacetên wan ji yên me cudatir bûn.Ew di şikeft û qulên daran de dijiyan û xwe ji sermê diparastin.Ew tazî digeriyan,geya û goştê lawiran(heywanan)bi xavî dixwarin.Hacetên wan ji dar û keviran bûn.Ewan bi dar û keviran nêçîra xwe dikirin.Lawirên ku digirtin,goştê wan dixwar û çermê wan (eyar)li xwe dikirin.Paşê ewana çirûskên agir peyda kirin(wek lihevxistina kevirên hestep û bihev firkandina daran).Bi vê nevê agir peyda bû û ewan êdî xwarina xwe dibirajtin û bi xavî ne dixwarin.Ji wê heyamê re"heyama keviran" tê gotin.

Paşê ji kevirên çeqmaqan û ji kevirên din,hacetên hêjatir afirandin.Bi vê nevê jiyana wan hê pêşdetir çû.Ew li qiraxên çem û beriyan bi cîh bûn.Êdî dest bi xwedî kirina lawiran kirin. Lawirên wek Kûçik,dewar hesp û mirîşk bi xwedî kirin.Ji ber ku ewan hacetên xwe cîla dikirin ji wê heyamê re"heyama kevirên bi cîla" tê gotin.Piştî sal û zeman ew hînî bikaranîna madenê bûn,berê sifir,paşê jî hesin bi kar anîn.



ji wê heyamê re jî"heyama madenê"nat gotin.



H A C E T

Berî bi hezar salan evqas hacet û mekîne tunebûn.Mirovên wan heyaman hemû kar û barê xwe bi lebatên xwe pêk dianîn.Ew bi piyên xwe,bi lingên xwe û bi destên xwe dixebitîn û pir diwestiyan.Ji hin kevir û daran ji xwe re hacet çêdikirin û mercên jiyana xwe hêsantir dikirin.

Piştî derbasbûna salan mirovan teker(!) peyda kirin.Bi vê nevê hindikî diwestiyan û pir kar dikirin.Bi dîtina teker bajarvanî hêdî hêdî bi pêş ket û fireh bû.Lê îro teknîk bi pêş ketiye û mekînak bi tena serê xwe kare karê gelek mirovan bike.

www.arsivakurd.org

N I V Î S

Serketina mirovan ya herî mezin,di heyama madenê de peydakirina nivîsandinê ye.Piştî ku,nivîsandin dîtin,hem zûtir bi pêş ketin û hem jî gelek tişt di derheqa jiyana xwe de hiştin.Em jiyana wan ji zana û pisporên dîrokê û ji yên zimên hîn dibin.Ilmê ku,jiyana mirovan,derbasbûna welatan,kar û kirinên wan hînî me dike, jê re"Dîrok" an "Tarîx" tê gotin.Ilmê dîrokê bi peydabûna nivîsandinê re derketiye meydanê.Ji heyama peydabûna nivîsandinê re"heyama dîrokê"tê gotin.



Berî 4-5 hezar sal,Kurdan jî bi tîpên mîxî yên ku"AKAD û SÛMIR" dişorandin(îstîmal dikirin)dinivîsandin.Paşê berî mîladê bi hezar salî merivek bi navê"Masîsûrat" tîpên din çêkirin.Kurdan êdî bi wan tîpan nivîsandin.Ga va Ereban Kurdistan dan bin lingên xwe û ew leyandin(îşgal kirin)tîpên Kurdan Masîsûrat bûn.Piştî îslamê Kurdan dev ji tîpên kevnare berdan û bi tîpên Erebî nivîsandin.Îro li gelek ciyên Kurdistanê tîpên latînî tên şorandin.

SALNAME Û SEDSAL

Îro salnama ku em bi kar tînin,roja çêbûna Îsa pêxember e.Ji ber ku,ji roja çêbûna Îsa pêxember re"Mîladî" tê gotin,salnama ku em bi kar tînin jî bi"salnama mîladî"tê bi nav kirin.Di salnama mîladî de sal 365 roj û 6 seet e.

Sedsal di salnama mîladî de 100 qatî 365 roj û 6 seetan e.Ano,sed sal e.Bûyerên dîrokî bi sedsalan hêsantir tên gotin.Em niha di sedsala bîstan(xx)dene.Sedsala bîstan ji 1900 î dest pê dike û dawiya 1999 an diqede.Piştî wê emê têkevin sedsala bîst û yekê(XXl)



www.arsivakurdi.org

C Î H A N

Ez Cîhan im qîza Kurd im
Ji bo war û welat merd im
Doza min her Kurdistan e
Ji bo wê ez îd û cejn im

Cejnê dikim ji bo wara
Jê re dikim kar û bara
Ji bo xweşkim Kurdistanê
Weke dema KEY EXSARA

Dixwînim ez dibistanê
Da avakim zû eywanê
Tê de rûnim ser û serhêz
Bikim behsa Kurdistanê

Bi destê min ala sor e
Li ser wan hildidim jor e
Dibêjim ez best û siruz
Ji boyî min xweş destûr e

Destûra min dibêje min
Zû bavêje barê dijmin
Jê re neke kar û xebat
Jê re ne hûn ne yek hev in

Ez Cîhan im cîhan xwaz im
Ji wê dozê qet ranazim
Bi pêş diçim bi şev û roj ê
Ji ber dijmin ez nabezim

Gazî dikim li xweh û bra
Bi destê xwe digrim çira
Bi dû min de bila bêne
Rastî dibêm nakim vira

Rastiya rast her xwendin e
Xwendin aqil şidandin e
Bi aqil nû dibin em rast
Doza me her ev xwestin e

www.pirsakurdi.org

Ger em tevde bibin xwenda
Ji bo welat weke finda
Ronî didin li ser zevyê
Li tariyê nabin wenda

Tarî tîç û ronî hate
Em ciwan bîn weke kat e
Li nav şewqê dikin meşê
Dibînin em Ararat e

Bengî bavê tu revana
Dersê bide xwendevana
Zevî xwaze gav û demê
KURDISTAN serê cîhan e

★ ★ ★ ★ ★

BENGÎ

www.arsivakurdi.org

N Ê Ç Î R

Rokê şêr rovî û gur
Bi hevdû re bûne bir
Ji bona nêçîra xwe
Tiştek nema ku nekir
Carekê gayek dîtin
Nav û dil hatin sotin
Tev kenîn simbêl badan
Bi hevre êrîş dadan
Gayê reben da bezê
Êrîş kirnê bi geza
Mefer ji ga re nema
Her sê ketin ser hema
Şêr gote gurê birçî
"Were par veke bi cî
Para her kesî wek hev
Da kes nemîne birçî"
Gur par vekir goştê ga
Kir sê parçe û ziq ma
Gewde,hestî dane şêr
Hêt ji xwer bir gurê mêr



Ji rovî re ma telêr
Çaxa şêr evna bihîst
Yek li gur xist li ser lîst
Gurê mêr li wir can da
Şêr cardin simbêl bada
Gote"rovî par veke
Tu neheqiyê nake"
Rovî gotê"ez zanim
Van kara baş dizanim
Tu padîşahê meyî
Para yekem ya teye
Te ga kuşt û te ew girt
Te para didwan jî girt
Bê guman para sisyan
Nayê xwarin bi hêsan
Xwediyê para sisyan
Şêrê li serê çiyan
Û ew jî bi xwe tuyî
Her sê par mafê tene
De noşîcan be têr bux
Bi ser de avê jî vexw"
Kêfa şêr gelekî hat
Simbêl bada li ser lat
Go"ho xwarziyê rovî
Tu kengî bûyî sofî?
Te daye ser riya çak
Ev tiştekî gelek pak
Rastî bêje bibe mêr
Ez im xalê te yê şêr"

Brîndar

18.4.1985

BÎRANÎNA 24 Ê NÎSANÊ 1974

Zarokno!

Welatê me welatekî gelek xweş e,welatê me gelekî dewlemend e,şêrîn e,hatin û çûyîna me,hebûn û nebûna me tev ew e. Jîna me pê girêdayî ye.Ew serî lê em gewde ne,ew hestî lê em goşt in,em reh in lê Kurdistan xwîna me ye.

Ji ber vê xweşî û dewlemendiya welatê me,dijmin dev ji me bernadin. Ji bo menfeeta xwe hemû bênamûsî û bêşerefî dane ser milên xwe û welatê me yê şêrîn xistine bin destên xwe, talan kirine û bi bê şermî hebûnên Kurdistanê yên ser û bin erdîn ji xwe re dibin.

Ev bêbav û bêjiyên ku,meriv nizane bê bezê bin guhê wan ji ku ye,bi wan kar û kirinên xwe,bi talankirina welatê me têr nabin.Îcar her ku diçin hartir dibin û barê xwe yê bênamûsiyê girantir dikin.Êrîşan dibin ser gelê me yê reben,gelê me yê gerdenxwar.Mirovan ji hev nas nakin.Nabêjin"ev jin e,ev kal e an ev zarok e"

Hema heçî ku navê wî Kurd be û xwîna Kurdayetiyê di rayê wan de hebe,ew ji bo wan dijmin in.Bi barbarî û nemirovî êrîşî ser dikin.

Ji dijminan yek ji wan jî koledar û barbarên Iraqê ne.Evan bênamûsan heta ji wan hatiye êrîşî ser doza netewa Kurd kirine,bi xwînê ketine Kurdistanê.Jin û mêr,pîr û kal,zar û zêç ji hev cuda ne kirine,ketine xwîna bi hezaran Kurdên bê tawan(bê sûc).

Koledar û çepelkarên Iraqê di sala 1974 an de cardin bi êrîşên xwe yên xayînî çûn ser doza netewa Kurd.Ewan bêjiyan dibistana bajarê QELEDÎZÊ (li başûrî Kurdistanê) di 24 ê Nîsana 1974 an de bi balafiran bombardûman kirin û bombên napalm li ser barandin.Di vê dibistanê de 400 zarokên Kurdan dixwendin.Haya wan zarokan ji bayê felekê nebû.Lê koledaran şerm nekirin û her çarsed zarokên Kurd li wir qetil kirin.Bi vê nevê ew zarokên Kurdan jî weke bav û kalên xwe ketin nav koma şehîdên Kurdistanê.

Zarokno! Mezinên pêşerojê!
Li welatê me Kurdistanê ne 400 lê bi hezaran zarokên bê sûc di bin pêlavên koledaran de hatine perçiqandin û goriî bûne.Bi sedan car zikên dayikên me hatine qelaştin û zarokên wan berî ku çavên xwe li dinê vekin,hatine qetil kirin.

Ji vê yekê zarokên Kurdan!
Divê em li her cî û li her derê li hebûna xwe,li Kurdîtiya xwe bi xwedî derkevin.Hebûnên xwe biparêzin.Zimanê xwe,çanda xwe,gerdîş(adek)û toreyên xwe hîn bibin,bidin hîn kirin. Wan berûpêş bibin.Divê em zarokên Kurdan ji serî heta bi binî li hebûnên xwe bi xwedî derkevin,baş dibe xirab dibe bila bibe.Tiştên baş divê em berûpêş bibin û tiştên xirab jî rast bikin,kêmasiyên wan derxin û wan jî bighînin tiştên qenc.

Ger ne wilo be,ger em li hebûna xwe û li hebûnên xwe bi xwedî dernekevin emê nikaribin erka xwe ya Kurdîtiyê bînin cîh.Wê dilê zarok û şehîdên Kurdistanê di goran de bi kul û xem

bimînin.Em dê nikaribin dilê wan geş bikin û her weha wê kêfa dijmin û neyaran bi me bê.Ji xwe daxwaza dijminan jî ev e ku,em li hebûnên xwe xwedî dernekevin ,da ku ew bi hêsanî me bişerînin(înkar)

Zarokno!

Hebûna me Kurdîtiya me ye.Hebûnên me çand,adet û toreyên Kurdî ne. Parastina wan erka me teva ye û ev kar bi kar û xebatê ve girêdayî ye.Û armanca xebata me ya bingehîn jî divê ji bo Kurdistanê be.Armanca me ya herî bilind divê serbixwebûna Kurdistanê û azadiya gelê me be.Divê armanc ji bo li hewa pêlvedana ala rengîn be!

X X X X X X X X X X X X X X X
x x x x x x x x x x x x x x x
X X X X X X X X X X X X X X X
x x x x x x x x x x x x x x x
X X X X X X X X X X X X X X X

www.arsivakurdi.org

HEY ÇIÇEK

Hey çîçek,çîçek,çîçek
Hey çîçekên Kurdistan
Bi we her cî dixemile
Hawîrdor bax û bîstan

Bi hebûna we geş in
Sermest dilgeş û xweş in
Rû bi ken in dar û ber
Deşt û çiya û zozan

Hûn xemla Kurdistan in
Weke bûkên ciwan in
Hebûnek ji xwezayî
Parçekî ji cîhan in

Hinek ji we kesk û sor
Hinek ser û gewr û mor
Spî û gewher in hûn
Wek ala Kurdistan in



Hûnê timî azad bin
Timî rûgeş û şa bin
Namînin bê tirs û jan
Ger rizgar be Kurdistan

Reşadî
18.4.1985

www.arsivekurdi.org

Xîret û bêxîret

Yê bêxîret got:
-Ezê îro bigerim û sibê bixebitim
Yê bi xîret got:
-Ezê îro bixebitim û sibê bigerim
Lêma dibêjin:
"Karê îro mehêle sibê"....

* * * * * * * * * * *

Nêçîrvan

Alan û Adî çûne nêçîrê.Alan deng li hevalê xwe kir û got:
-Were,were,min hirçek girtiye!
Adî got:
-De bîne were
Alan dibêje:
-Ez nikarim bînim
Adî dibê:
-Madem ku nikarî,tu were!
Alan dibê:
-Ne,nahêle!..

☆

Têmûrê Xelîl Mûradov
Êrîvan

www.arsivakurdi.org

P Ê K E N Î N

PAPAXAN

Di wextekî de çend mirov ji bo armancên Komunîzmê dixebitîn û mirovên Komunîst bûn.Evan mirovan xwe gelekî diêşandin û nizanîbûn bê westan çi ye.

Papaxanekî wan mirovan hebû,yekî bi aqil bû û zû tişt diketin serê wî.Xwediyê wî çi digot,Papaxan jî li wan vedigerand û texlîta wan dikir.

Carekê papaxan xwe şaşkir û got:
"Bimre doza we"

Çaxa xwedî ev gotin ji papaxan bihîst pir aciz bû.Rabû hema bi stuyê wî girt û bir kir koxa mirîşkan.

Papaxan di koxê de ma.Diçe vî alî û aliyê din.

Piştî qederekê mirîşk tev hatin koxê. Carekê dîtin ku,va tebayekî biyanî û kesanedî di koxa wan deye.Mirîşkan awirên xwe tûj û madê xwe tirş kirin.

Papaxan tê gihişt ku,mirîşk jê aciz bûne.Papaxan xwe buxbuxand û got:
-Bi awirên tûj li min nenerin,ez ji siyasetê ketime koxê haaaaa!....

BRÎNDAR

E Q L Ê K E R Ê

Ga ji cot vegerya bû,pir westiya bû.Ga bi çavên melûl li kerê mêze kir û got:"Ji bo rehetiyê gerek meriv ker bihata dinê.Heftê carekê xwedyê xwe dibe bajêr û hew".

Kerê jê re got:

-Min heta niha ev gotin ji te ne bihîsti bûn.Xuyaye tu pir westiya yî

-Ma westîn jî gotin e!canê min derket.Paşê jî bi qaşilekî zebeş debar bike!

-Ger te serê xwe bixebitanda,tu ne diket vî halî

-Brakê ker,ji bo xwedê eqilekî bide min gidî!

Dilê kerê bi ga şewitî

-Vê êvarê qaşilên zebeşan mexwe.Serê sibê têr rakeve û bêhna xwe bi xurtî bide û bistîne û biore.Bi vê nevê te naxebitînin.

Adinî rojê tev li ser serê ga kom bûn,ji bo bijûndariya ga çi ji destê wan hat teqsîr ne kirin.Ji bo ku vala nemînin îcar ker birin cot.Di wê germa hâvînê de canê kerê derket.

Dawiya heftê ker û ga rastî hev hatin.Ga ji kerê re got:

-Ez vê qenciya te heta mirinê ji bîr nakim

Kerê bersiv neda,lê di dilê xwe de got:

-Ez jî ji bîr nakim,lê ne qenciya xwe,kerîtiya xwe!







K O N E T Î

Merivek li nav daristanê digeriya.Carekê rêbirekî dest bi çek derket pêşiya wî û got:

-Ya ji perê te ya ji canê te!

Ewî bi dengekî nerm got:

-Bê guman ezê perê xwe bidim.Lê çaxa ez bê pere vegerim malê wê jina min pir aciz bibe û ji min bawer nake.Ya baş ezê çakêtê xwe derxim,tu çend berkan(fîşekan)berdê da ku,jina min bawer bike ku,rêbiran perê min birine.

Yê rêbir ecêbmayî ma

-Niha tu ji jina xwe ditirsî?

-Erê bi serê te yê delal

Yê rêbir rabû du berik bera çakêt û didu jî berdan şevqa wî

-Qurban ji kerema xwe çend libê din jî berdê,bi serê te jina min min sax nahêle gidî

Yê rêbir du berikên din jî berdan çakêt.Ewê din pantorê xwe derxist û xwest ku bera pantor jî bide.Lê berikên rêbir qedya bûn

-Berkên min qedyan,ez nikarim berdim pantor

-Madem wisa ye ez jî pera nadim

Yê rêbir tê gihişt ku hate xapandin.Hema ji wir bazda.









www.arsivakurd.org

SÎSTEMA VALAKIRNÊ

Sîstema valakirnê ji çend lebatan(organan) pêk tê.Erka wan lebatan eve ku xwêya di xwîna meriv de li hev derxe (eyar bike) û tiştên bi xisar ku,çaxa ew di xwînê û di organîzmê de bimînin ji bo meriv metirs e(tehlûke ye),bi riya xwêdan an jî mîzê derxe der.Xwêdan û mîz di organîzma meriv de du bûyerên girîng in.Laşê meriv rojê nêzîkî 1,500 gram mîz,1000 gram xwêdan û 500 gram jî bi riya bêhnê tiştên ku,ji bo organîzma meriv bi zirar in,tavêje der.Heger laşê meriv bi riya hin lebatan ev pîsî navêtana der,wî çaxî ew tev li xwînê dibûn,xwîn bi jehrî dibû û organîzma meriv diket krîzekê mezin.

GURÇÎK:Gurçik di paş zikê meriv de cîh digire,li rêza parsûyên dawî radiwestin û du lebatên mîna fasûlya ne. Mîza ku,gurçik davêje der dikeve kîskê mîzê ku,qederê 350 gram av dikevê.Bi alîkariya hin lebatan ev av ji kîskê mîzê vala dibe û derdikeve der.Bezên xwêdanê ku,di gelek ciyên laşê meriv de hene,weke gurçikan maddeyên jehrî bi şiklê xwêdanê tavêjin der



www.arsivakurdi.org

SÎSTEMA BÊHNÊ

Sîstema bêhnê ji çend lebatan pêk tê. Erka wan(wezîfa wan) bicîhanîna bêhnstandin û bêhnberdanê ye.Ano(yanî)standina Oksîjenê(02) û berdana Karbondîoksîtê(Co2)ye.

Bêhn bi alîkariya dev û poz tê standin û berdan.Piştî wê,valatiya poz û qirik tê.(ji ber ku,li dora qirikê têlên deng hene,çaxa hewa tê re derbas dibe meriv êdî kare biaxive)Piştî qirikê lûla bêhnê tê.Lûla bênê wek çuqlî ye. Lûlak jê diçe cegera çepê û ya din jî diçe ya rastê.Ev lûle her ku diçin piçûk û zirav dibin û li tevayiya herdû cegeran(kezeban) belav dibin.Li wir di navbera xwînê û hewa de danûstandina gazê dikin û xwîna ne paqij paqij dikin.

CEGER:Ceger lebatek wek sînger û lastîkê ye.Her cegerek(kezebek)bi zarekê dorpêç kirî ye.Navê wê zarê"Plevra" ye û bi rûn e.Çaxa hewa dikeve cegeran,ew dinepixin û çaxa hewa ji wan derdikeve ew dipiçin.Bi vê nepixîn û piçînê,em hewa paqij distînin û hewa ne paqij berdidin der.


Nêrgiz! ma tu jî dixwazî bi me re bê? Em dixwazin biçin Seyrangehan
Bijî, bijî! îro hewa xweşe, emê ji xwer bilîzin
xwarin madeye hevalno!
Va av jî heye
Ma hûn dixwazin bi gokê bilîzin?
Ha ji we re bilîzin
Me roja xwe bi xweşî derbas kir. Êdî em biçin malê.



Hejmaran bighînin hev binerin bê wê çi derkeve



Nêrgiz dixwaze bigihê çentê xwe.Gelo hûn karin wê bighînin çentê wê ?

K A K I L Ê N Z Ê R Î N

Şêr bi hêrsa xwe
Rovî bi fenên xwe
Û meriv jî bi welat
û zimanên xwe tên
nas kirin

X A Ç E P I R S



Çeperast:

1-Navê qehremanekî Kurd

2-Navê jinekê....ne ez,ne tu,lê....?

3-Yewmîye,perê rojê,keda rojê

4-Navê mehekê

5-gotina nexwestinê

6- îmtîhan

7-Çaxa dinya dicemide(berepaş)

8-Noteyek(berepaş)..Navê mêrekî..

Serejêr:

1-Yên ku pez didoşin

2-Apo

3-Xezete,nama rojê(cerîde)

4-Noteyek...mûwên li ser çav(burh)
(berepaş)

www.arsivakurdi.org

5-Noteyek(berepaş)..Fêkiyek..

6-Yê ku tiştekî nizane..Noteyek

7-Ne min,ne te,lê...?...tiştekî xwarinê

- -

Bersiva xaçepirsa hejmara 19 an

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1	N	A	R	I	N	C	I	Y	Ê
2	A	M	E	D	■	■	■	A	N
3	Z	O	Z	A	N	■	O	B	Î
4	L	■	■	N	O	Ş	■	O	R
5	I	R	O	■	K	O	R	■	S
6	Y	A	D	Ê	■	R	A	B	E
7	Ê	M	■	R	O	■	B	A	N

www.arivekurdi.org

NAVEROK rûpel

Zarok fêkiyên malan e.....1
Al min.....2
Marşa netewî.....3
Mirovên berê.....4
Hacet.....5
Nivîs.....6
Salname û sedsal.....7
Cîhan(helbest)/Bengî.....8
Nêçîr../Brîndar.....10
Bîranîna 24 ê Nîsanê 1974....11
Hey çîçek/Reşadî.....15
Xîret û bêxîret/T.Xelîl Mûradov..16
Pêkenîn/Brîndar.....17
Aqlê kerê.....18
Konetî.....19
Gurçik.....20
Sîstema valakirnê.....21
Bêhn.....22
Sîstema bêhnê.....23
Lîstik.....24
Mijûlî.....25
Xaçepirs.....26

www.arsivakurdi.org

www.arsivakurdi.org



YAN

KURDISTAN

YAN NEMAN !

UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNÎŞAN

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

PRIS : 10:- skr

BIHA

www.arsivakurdi.org